# LIHEVKIRINA di navbera Saziya Rêvebirina Kursê û beşdarê kursê de li gorî benda 4 ji xala 8 a Rêziknameya Pêşxistina Zimanê Elmanî (DeuFöV)

**Di dewama vê lihevkirinê de ji ber sedemên hêsankirina zimanî tenê zayenda nêr tê bikaranîn. Bêguman mebest hertim zayendên nêr û mê ne.**

## Di navbera

| |
|---|
| Paşnav, nav û roja jidayîkbûnê ya beşdarê kursê |

## û

| |
|---|
| Nav û navnîşana Saziya Rêvebirina Kursê de |

## li ser van xalên li jêr tê lihevkirin:

### 1. Mesrefên kursê

Beşdariya di dewreyeke fêrkirina zimanê kar (Berufssprachkurs) de bi gelemperî bêpere ye.

Li derveyî vê qaydeyê, kesên karker ku ti alîkariyeke aborî ji bo debara jiyanê li gorî Cilda duyem a Yasaya Civakî (SGB II), Cilda heftem (SGB XII) an jî Yasaya Alîkariya aborî ya Penaxwazan (AsylbLG) wernagirin, anjî mafê wan yê wergirtina "Meaşê Bêkariyê I" (Arbeitslosengeld I) tine, herwiha ne di xwendina pîşeyî ya li gor benda 1 ji xala 57 a Cilda sêyem a Yasaya Civakî (SGB III) de ne û ne di kursên amadekariya ji bo tevlîkirina kar de ne, herwiha yên ku hatina wan ya salane zêdetirî 20000 Euro (tenê) an  40000 Euro (zewicî) be, ev kesên li jor hatine rêzkirin, divê mesrefên kursê bi xwe bidin. Saziya Rêvebirina Kursê (Kursträger) divê di dema xweqeydkirinê de beşdarên kursê ji van rêzikên têkildarî pişk û para mesrefê haydar bike. Mesrefên kursê divê ji bo tevahiya dersên kursê di destpêka kursê de radestî Saziya Rêvebirina Kursê werê kirin.

Kesên karker, ku bi belaşî beşdarî Dewreya Fêrkirina Zimanê Kar dibin, ji ber ku dahata wan a salê sînorên li jor diyarkirî derbas nakin, eger Dewreya Fêrkirina Zimanê Kar bi awayê nîvco berdin û sedema vê berdanê di wan de be, divê mesrefên kursê bi xwe bidin. Karkerên beşdar di dewreyê de, eger Dewreya Fêrkirinê bi awayê nîvco berdin û sedema berdanê ne bi wan ve

girêdayî be, divê belgeyeke bikêrhatî ku vê yekê diyar dike radestî Daîreya Federal (Bundesamt) bikin.

Pirtûkên fêrkirinê ji aliyê Saziya Rêvebirina Kursê bêpere radestî beşdarên kursê tên kirin.

## 2. Mesrefa hatûçûnê

Beşdarên ku

- Meaşê Bêkariyê 1 (SGB III)
- Meaşê Bêkariyê 2 (SGB II)
- Alîkariya Dewletê (SGB XII)
- Alîkariya Ciwanan (SGB VIII, li şûna meaşên li gorî Yasaya Alîkariyên ji bo Penaxwazan)
- Wergirtinên li gorî Yasaya Alîkariyên ji bo Penaxwazan (AsylbLG)
- Alîkariya Fêrbûna Pîşe li gorî Yasaya 56 ji Pirtûka SGB III werdigirin,

dikarin alîkariya aborî ji bo mesrefên hatûçûna pêwîst werbigirin. Eger wergirtina alîkariyên aborî yên dewletê di heyama beşdariya di kursa fêrkariyê de were rawestandin, kesê beşdar divê vê mijarê bilez ragihîne Saziya Rêvebirina Kursê û Daîreya Federal.

Alîkariya aborî ji bo mesrefên hatûçûnê di rewşekê de tê dayîn, eger kurttirîn rêya peyaçûnê ji malê heta cihê fêrkirinê û/an cihê ezmûna dayîna bawernameyê herî kêm 3 kîlometre be. Daxwaza alîkariya aborî ji bo mesrefên hatûçûnê divê bi rêya Saziya Rêvebirina Kursê werê raberkirin. Eger serlêdan werê redkirin, kesê beşdar di kursa fêrkirinê de dikare nerazîbûna xwe li hemberî redkirina daxwazê nîşan bide, an jî Saziya Rêvebirina Kursê bike wekîlê xwe, da ku ew bi nûnertiya kesê beşdar itirazê bike.

Eger serlêdana alîkariya aborî ji bo mesrefa hatûçûnê ji aliyê Daîreya Federal ve werê qebûlkirin, ev alîkariya aborî wê tevahiya heyama beşdariya di Dewreya Fêrkirinê de werê dayîn. Eger mesrefên hatûçûnê bên guhertin, ev qebûlkirin naguhere. Eger cihê jiyanê an cihê fêrkirinê werê guhertin, ev qebûlkirin êdî hildiweşê. Di vê rewşê de eger pêwîst bike, divê serlêdaneke nû werê raberkirin.

## 3. Çavdêriya Zarokan

Saziya Rêvebirina Kursê ji bo peydakirina mecalên çavdêriya zarokan di heyama Dewreya Fêrkirinê de alîkariya beşdaran dike.

## 4. Destpêkirina Kursê

Kesê rêpêdayî ji bo beşdariya di dewreyê de divê di heyama 4 hefteyan de piştî qeydkirinê beşdarî Dewreya Fêrkirina Zimanê Kar bibe. Eger dewreya fêrkirinê neyê rêkxistin, Saziya Rêvebirina Kursê divê saziyeke din ya dewreyên fêrkirinê, ku dewreyeke fêrkirinê ya munasib li dar dixe, bi beşdarê kursê bide nasandin. Saziya Rêvebirina Kursê divê orîjînala belgeya mafê tevlîbûna kursê radestî beşdarê dewreyê bike û Daîreya Federal ji wê yekê haydar bike ku beşdar wê tevlî kursa saziyeke din a dewreya fêrkirinê bibe.

Beşdarê dewreyê divê guhertinên navnîşana xwe bilez ragihîne Saziya Rêvebirina Kursê. Guhertina Dewreya Fêrkirinê tenê di peydabûna rewşeke dijwar de pêkan e. Rewşa dijwar wek mînak demekê ye ku gihîştina bo cihê fêrkirinê piştî guhertina cihê jiyanê bi qasî 90 deqîqeyî be. Eger kesê beşdar bixwaze kursa xwe biguherîne, divê vê daxwazê ji ofîsa navendî ya têkildarî Daîreya Federal a Koçberî û Penaberan (BAMF) bike.

Eger ji neçarî tevaya dewreya fêrkirinê ji aliyê Saziya Rêvebirina Kursê ve beriya dema diyarkirî were rawestandin, divê ew sazî ji bo beşdarên dewreyê dewreyeke cîhgir a bikêrhatî peyda bike.

## 5. Tevgeriyan di dema kursê de

Beşdariya di dersan de divê ku bi awayê rêkûpêk û di dema xwe da pêk were. Kesê beşdarî kursê razîbûna xwe radigihîne ku bi awayekî çalak tevlî plandariştina fêrkirinê bibe.

Rêzikên Saziya Rêvebirina Kursê divê werin berçavgirtin. Binpêkirina rêzik û qaydeyên saziyê dikarin bibin sedema dûrxistina ji kursê.

## 6. Demên amadenebûnê

Di heyama demên kursê de bêhnvedaneke li gor plana kesê beşdar ne pêkan e.

Saziya Rêvebirina Kursê mijarên nîvcoberdana Dewreya Fêrkirina Zimanê Kar ji aliyê beşdarên dewreyê ve bilez ji Daîreya Federal û daîreya dayîna destûra beşdariya di dewreyê de radigihîne. Ji billî vêya, eger ji ber beşdarbûna ne-rêkûpêk metirsiya serneketina dewreyê peyda bûbe, Saziya Rêvebirina Kursê derbarê wan kesên ku ji aliyê Jobcenter ve bo beşdariya di dewreyê de hatine şandin, bilez Jobcenterê agahdar dike (Têkildarî pêveka benda 2 ji xala 9 ya Rêziknameya Pêşxistina Zimanê Elmanî - DeuFöV).

Saziya Rêvebirina Kursê bi taybetî di van rewşên li jêr diyarkirî de mecbûr e ku şikayeta beşdarên di dewreyê de bike, eger:

- di roja destpêbûna dewreya fêrkirinê de bêyî sedemeke giring
- di herî kêm sê rojên li pey hev de ji ber sedemeke giring an bêyî sedem
- di zêdetir ji sedî 20 (20%) ji dersên fêrkirinê de amade nebûbin.

Eger kesekî beşdarî kursê di sedî 30ê civînên fêrkirinê de amade nebûbê, êdî serketina dewreya fêrkirina Zimanê Kar nayê çaverêkirin. Di rewşeke wiha de, divê Saziya Rêvebirina Kursê Arbeitsagenturê (Daîreya Kar), anjî Jobcenterê û Daîreya Federal ji wê yekê haydar bike ku wî kesê beşdar kursa xwe nîvco hiştiye.

Eger beşdarê kursê di dersê de amade nebê, divê hertim belgeyeke sedema wê amadenebûnê hebe. Belge, wek mînak raporta bijîşkî, divê bilez radestî Saziya Rêvebirina Kursê werê kirin. Ji ber van sedemên li jêr, beşdarvanek dikare ji kursê dûr bimîne û tevlî dersan nebe:

| | |
|---|---|
| Nexweşî | **Heta rojekê ji dewreya kursê**, eger kesên beşdar Saziya Rêvebirina Kursê ji nexweşiya xwe bi rêya telefonê / devkî (di vê babetê da Saziya Rêvebirina Kursê têbîniyeke nivîsekê amade dike) an bi rêya nivîskî di destpêka qewimîna nexweşiyê de agahdar bikin<br>**Ji roja duyem û pê ve** divê belgeyeke bijîşkî were raberkirin. |
| Çavdêriya zarokeke nexweş ku hîn temenê 12 saliyê temam nekiribe û eger wekî din kesekî çavdêriyê tine be | Eger raporteke bijîşkî derbarê pêwîstbûna çavdêriya zarok bê pêşkeşkirin, ji roja yekê ya kursê ve |
| Amadenebûna pêşbînî-nekirî ya çavdêrê zarokekî ku hîn 8 saliya xwe temam nekiribe (wek mînak çavdêrê zarok nexweş be) | Li gorî piştrastkirina cihê çavdêriyê yê têkildar |
| Betalkirina çavdêriya zarokan, anjî girtina dibistanê, eger ku ew girtina dibistanê / saziya çavdêriya zarokan ji aliyê daîreyeke fermî / hikûmeta herêmî ve hatibe ragihandin û zarokê ku çavdêriya wê bê kirin hêj temenê 12 saliyê xilas nekiribe | Eger belgeyeke derbarê girtinê de bê pêşkêşkirin (eger li tevaya parêzgehê anjî nahyeyê anjî bajêr biryareke girtinê ya dibistanan hebe, wê demê belge pêwîst nake) |
| Çavdêriya endamekî malbatê, eger ew kes di heman mala kesê beşdarê kursê de bijî | Li gorî raberkirina raporta bijîşkî, ku tê de pêwîstiya çavdêriya endamê malbatê tê diyarkirin |
| Zewaca beşdarên kursê | **Du rojan ji dewreya kursê**, piştî raberkirina belgeya têkildar (belgeya zewacê) |
| Parastina jinên ducanî | Li gorî raberkirina belgeya têkildar (wek mînak raporta bijîşkî) |
| Zarokanîna hevjîn an hevpara jiyanê ya kesê beşdarê kursê | **Du rojan ji dewreya kursê**, piştî raberkirina belgeya têkildar (wek mînak raporta bijîşkî, belgeya zarokanînê) |
| Mirina hevjînê/a, hevparê/a jiyanê bi wateya Yasaya Jiyana Hevpar, mirina zarokekî an yek ji dêbavan | **Heta du rojan ji dewreya kursê** li gorî raberkirina belgeya piştrastkirinê<br>**Heta pênc rojan ji dewreya kursê**, eger rêûrisma binaxkirina endamê malbatê li derveyî Elmanyayê were lidarxistin |
| Vexwestina ji aliyê daîreyekê ve<br>(wek mînak Daîreya Biyaniyan / Dadgeh) | Li gorî raberkirina belgeya têkildar |
| Amadenebûna destûrdayî ji aliyê daîreya ku beşdar şandiye kursê | Li gorî raberkirina belgeya têkildar |
| Daxwazên bêhnvedanê yên karker û şagirtan ku ji aliyê xwediyê kar ve hatine qebûlkirin | Kopîya daxwaza bêhnvedanê ya qebûlkirî |

| | |
|---|---|
| Fermana qedexeya derketina derve ji aliyê daîrekeye têkildar ya hêrêmî ve | Li gorî raberkirina belgeya têkildar (pêwîst nake, eger bê zanîn ku li navnîşana kesê beşdar qedexeya derketina derve heye) |
| Beşdarbûna testeke diyarkirina nexweşiya COVID-19 | **Di roja testê de, herwiha ji bo wan rojên ku li benda encama testê tê rawestandin,** li gorî raberkirina belgeyên têkildar |
| Eger kesê beşdarê kursê dikeve çarçoveya koma metirsîdar, ku ji aliyê tibî ve têkildarî COVID-19 nexweşiyeke dijwar derbas dike, eger mecal nahatibin paydakirin, ku bi şêwazekî vîrtûel (online) têvlî dersê bibe | Eger raporteke bijîşkî bê pêşkêşkirin ku wê yekê piştrast dike ku kesê beşdar dikeve çarçoveya wê koma metirsîdar<br>Têbînî: Eger beşdarê kursê dikeve çarçoveya wê koma metirsîdar jî, dîsa bi kêfa xwe dikare li cihê kursê tevlî kursê bibe. |

Saziya Dewreya Kursê belge û raportên bijîşkî yên radestkirî an belgeyên din ên têkildarî bi sedemên amadenebûnê li ba xwe diparêze.

## 7. Ezmûnên Sertîfîkayê

Saziya Rêvebirina Kursê ji bo her beşdarekî dewreyên Kursa Zimanê Kar ezmûna sertîfîkayê li dar dixe. **Di kursên taybet de, bo mînak ticaret an kar û pîşesazî/teknîk, li şûna sertîfîkatê, belgeya tevlîbûna kursê digel zanyariyên têkildarî pêşketinên hînbûnê yên bidestxistî tê radestkirin.** Di rewşa serneketinê de, ezmûna sertîfîkayê dikare carekê werê dubarekirin.

Beşdarê kursê yê di ezmûnê de serneketî dikare ji bo dubarekirina dewreya kursê daxwazekê raberî Daîreya Kar (Arbeitsagentur) an jî Jobcenterê bike.

Ezmûna sertîfîkayê û dubarekirina vê ezmûnê ji bo beşdarê dewreyê bêpere ye.

Beşdarên dewreyê yên ku di dubarekirina ezmûnê de jî sernekevin, ji aliyê Saziya Rêvebirina Kursê ve belgeya tevlîbûna kursê digel zanyariyên têkildarî pêşketinên hînbûnê yên bidestxistî werdigirin. Kopîyeke belgeya piştrastkirina beşdariya di dewreyê de divê ji aliyê Saziya Rêvebirina Kursê ve ji bo Daîreya Federal, herwiha ji bo Arbeitsagentur anjî Jobcenterê werê şandin. Encamên ezmûnên sertîfîkayê jî divê ji bo daîreyên behskirî werê şandin.

## 8. Berhevkirina zanyariyan

Dane û zanyariyên têkildarî beşdarvanan dikarin tenê bi berçavgirtina rêzikên têkildar (herwiha yasa û rêzikên Parastina Jiyana Xusûsî û kesane) tenê ji bo lidarxistin û hisabdariya dewreyên Fêrkirina Zimanê Kar li gorî rêzik û qiraran werin bikaranîn û bo daîreyên rêpêdayî bên şandin (wek mînak Daîreya Federal (Bundesamt), Daireya Kar (Agentur für Arbeit), Dezgehên Xizmetên Bingehîn (Träger der Grundsicherung)). Ev dane û zanyarî nabe ku ji bo armancên din, bi taybetî armancên ticarî, werin bikaranîn, herwiha divê nekevin ber destê kesên sêyem.

Daneyên beşdaran divê herî dereng piştî pênc salan ji aliyê Saziya Dewreya Kursê ve bên jêbirin.

Kesê beşdarê kursê xwedî wî mafî ye ku belgeyên têkildarî xwe bibîne.

, roja

Cîh, dem

Destnîşana beşdarê kursê

*(Bêzehmet li ber çav bigrin: Bêyî destnîşanê, tevlîbûna beşdarên xwedî mafê tevlîbûnê ne gengaz e. Beşdarên di jêr temenê 18 salî de, an destnîşana dêbav anjî ya wekîlê qanûnî pêwîst e.)*

Mohra Saziya Rêvebirina Kursê